

Bidestveanîna mafên neteweyî
yên gelê Kurd di çarçoveya
Îranek Demokratîk û Federal de

Hejmar: 126
5'ê Çileyê Paşîn a 2010
Buha: 150 Tûmen

agiri

Pîroz Be Sala Nû Ya Zayînî

Bi hilkevta nûbûna salê û destpêkirina Sala 2010'an, em pirozbahiyê li hemû xûşk û birayên mesîhî û gişt kesên dîkin ku vê rojê pîroz radigirn û hêvîxwazin sala nû ya Zayînî her bi wî awayî ku bi şadî û cejn girtinê destpê dîke bi xêr û xweşî jî derbas be û bibe sala nemana pîrisgirêkan û çî bi çî bûna hez û hêviyên hemû ew kesên ku bo aşî, aramî û destveanîna azadiyê dixebitîn. Carek din sala nû ya zayînî jî hemû aliyekê pîroz be.

PDKî
Deftera Siyasi
31'ê Kanûna 2009 a Zayînî, (10.10. 1388 ê Rojî)

Duheftînameya siyasi, civakî, çandî û hunerî

Partiya Demokrat ya Kurdistanê Îranê diweşîne

Tepeseriyên Hovane Di Roja Aşûrayê De



Li kolanên bajarên Îranê dubare xwîn diherike. Dîsan hawar li dijî zulmê bilind e. Dîktator heman dîktator e. Şeweyên serkûtê, heman şewe ne. Hêcet, heman tişt e. Qurbanî, xelkê bê berevan e. Bikujên têniyê xwînê, sînûrê çavsoyîyê nas nakin û li her ku û her dema rexnegirek dîtin, yekser heta dawî dajone ser. Di heman demê de ku laşê lawan dikeve ser kolanên sar û sir yê bi seqaya Zistanê cemidî, Kela zulm û zordariyê gav bi gav pitir dilerize û her ku zeman diçe, qelîştêkên tê ketî firehtir dibin. Bi lêketina zengilên mizgînhînerê lerizîna sitûnên Wilayeta zulmê, dîktator weke marê birîndar, hovane bi rast û çepê xwe vedide. **Dom di R 5**

Dest Hebûna Sipaha Pasdaran Li Revandin û Rehîngirtina 5 Birîtaniyan Li Bexdayê De

Rojnameya Gardiyên a Birîtaniyayî, Rêxistina terorîstî ya Sipaha Pasdaran a Îranê bi berpîrsiyarê dizî û revandina 5 şaromendên Birîtaniyayî li Îraqê di sala 2007'ê de tawanbar dîke.

Li gorî wê rojnameyê ew pîlan ji aliyê girûpek Şîe ser bi Sipaha Pasdaran di Şehreka Sedr a Bexdayê de hatiye birêvebirin. Paşan ew bo nawendek leşkerî ya hêza Quds li devera Qesr Şîrîn hatine veguhastin. Herweha rojname dide zanîn



ku hin ji rayedarên Îraqî jî li vê rehîngirtinê de dest hebûne. Wan 5 kesên memûriyet hebûne ku hevkarîya Wezaretê Darayî a Îraqê bikin heya ku dewsa bi milyard dolarên dizî ji dahata niştê û alîkariyên derveyî ji bo avedaniya Îraqê, bişopînin û vegeîrînine xizîneya welat. Lewre Îranê ew, bi rehîngirtinê heya ku dewsa xwe li vê diziyê de veşêre. Ji wan 5 êxîsîran, 3 jê hatine kuştin û çarenivîsa yekî din jî nediyar e. Tenê Pîtir Mor piştî du sal ji êxîsîriyê serbest hat berdan.

Rûpela 2

Rohkirin
ek Ji
Sekretari
yeta
PDKî...



Rûpela 4

Şiroveyek
Derheq
Bûyerên
Vê...



Silêman Keleşî

Rûpela 6

Vekirina
Dergehên
Demokrasi
yê Bi
Rûyê ...



Rostem Cehangîrî

Rûpela 7

Hilkevî û
Bone Dibin
Bela Serê
Wan



Azad Kurdî

Rûpela 10

Navê Min
Kurd e...



Paşa Amedî

Rohkirinek Ji Sekretariyeta PDKÎ, Derheq Rexneyên Civat û Aliyên Opozîsyonê Bi Pêşgirtina Helwest û Siyasetek Nerm Li Hember Rejîma Îslamî A Îranê

Di çend rojên borî de, hejmarek ji civat û aliyên siyasî yê Opozîsyonê di hunderê Îranê de peywendî bi PDKÎ ve girtine û li hember girtinepêşa helwest û siyaseta nerm li hemberî rejîma Komara Îslamî a Îranê rexne û nerazîbûna xwe nîşan dane û bi taybetî di rewşa niha de bi nedurust û dûr jî siyaset û kiryar û derbasbûya PDKÎ zanîne.

Di vê derbarê de, bo rohnkirina raya, giştî û bersiva wan dostan de, em radigehînin ku siyasetekî bi vî awayî peywendî bi komekê ve heye ku ji



PDKÎ cuda bûne û tu peywendiyek bi PDKÎ ve ninin. PDKÎ herwek berê li ser

usûl, siyaset û xebata lêbirawaneya xwe li dijî rejîma Komara Îslamî a Îranê berdeham û pêdagir e û mil bi milê azadîxwazên seranserê Îranê bi pêngawên qahîmtir bo hilosandina rejîma Komara Îslamî a Îranê û bo gihîştin bi serkevîna yekcarî, dê dirêjî bi çalakiyên berdeham yê xwe bide.

PDKÎ
Sekretariya
10'ê Befranbara 1388'ê Rojî
31'ê Kanûna 2009'ê Zayînî

Peyama Sersaxiya Nûneratiya Derveyî Welat Bi Boneya Koça Dawiya Kek Taha Etîqî

Bi dax û keserekî zaf ve, xebatkar û nîştimanparêzê kurd Taha Etîqî, li serûbendê hatina

sala nû ya Zayînî de, li 28.12.2009'ê ji ber rawestana ji nişkîve a dil li bajarê Bîl ê Swîsê de koça dawiyê kir.

Kek Taha Etîqî şoreşvanê PDK Îranê, berî şoreşa gelên Îranê bibû endamê nepenî yê rêxistina Partiyê û piştî serketina şoreşê li sala 1978'ê de jî bûye endamê êşkere yê hizbê. Li Kongireyên 4 û 5 yê PDK Îranê de bi Şêvirmendê Komîteya Nawendî hat hilbijatin û heya mişextbûna bo Derve wekî kadroyekî jêhatî yê Partiyê, bê westiyana xebat dikir.

Kekê Taha Etîqî mirovekî dilsoz,

rojnamevanekî biezmun, bêjerekî bişiyar, nivîskar û wergerekî lêhatî bû. Her di destpêka xebata xwe a nav refên partiyê de, bû bi yek ji kadroyên beşa ragihandina partiyê û birêveberên radyo "Dengê Kurdistanê a Îranê". Çendîn berhem û pirtûkên bimifah ji zimanê Kurdî bo Farsî û Farsî bo Kurdî wergerandine.

Serbarê xem û kovanên ji koça dawiya a kek Taha, em li ser navê Nûneratiya Derveyî Welat a Partiya Demokrat a Kurdistanê a Îranê, sersaxiyê dibêjine malbat, kes û kar, heval û hevçeperên wî û xwe bi çirîkê vê xemê dizanin.

Ruha Taha Etîqî şa be.

Partiya Demokrat a Kurdistanê



Îranê
Nûneratiya Derveyî Welat
Parîs 29.12.2009

Hukmê Mamosta Eyûb Gencî hat pejirandin

Dadgeha Şopandina bajarê Tehranê hukmê 10 sal

cezayê girtîgehê bo Mamosta Eyûb Gencî, çalakê olî û herwiha rexnegirê rejîma Komara Îslamî a Îranê pesend kir.

Li gor Ajansa Nûçegihaniya "Mukrian"ê, taya çar a Dadgeha şopandina bajarê Tehranê, biryara dadgeha taybet bi Rûhaniyeta Hemedanê piştî derbazbûn nêzîk bi çar mehan, ev hukm pejirand.

Mamosta Eyûb Gencî, jî aliyê



dadgeha taybet bi Rûhaniyeta Hemedanê ve bi 10 sal cezayê girtîgehê û durrîstinê hatibû mehkûmkirin.

Eyûb Gencî di destpêka sala 2008'an de, piştî rexnegirtin ji rejîmê di gotarekî nêmeja inê de hat girtin.

Mamosta Eyûb Gencî, pêşnêmejê berê yê mizgevtî Qobayî ya bajarê Sine bû, ku niha di girtîgeha nawendî ya bajarê Hemedanê de ye.

Guhertina Makezagonê, Garantiya Yekêtiya Turkiyê



Selîm Zencîrî

Li dîroka 87 saliya Komara Turkiyê de, eva cara duyemîn e ku bas ji çareseriya pîrsa Kurd û dawîanîna bi van tirajîdiyan tê kirin ku li wî welatî de hatine encamdayîn. Ya yekem li serdemê Turkut Ozal li destpêka salên 90'ê de ku her zû hate fetisandin û bê encam hiştin. Bi weteyek din îrade û xwasta şerxwaz û înkarkeran biserket. Ya din jî hikûmeta Erdoxan li çend mehên derbas bûyî de bo cara yekemîn ev pîrs anî rojeva Parlimentoyê. Dema ku Erdoxan li Parlimentoyê de li hemberî Partiyên tundrew û Şovenîst yê CHP û MHP'ê de sekinî, hemû kesek heyrîmayî kir û ji aliyê dinê jî hesta Kurdan bizivand.

Lê daxistina DTP'ê li 11.12.2009'an de bi biryarek siyasî, dîsan hemû gav û tekoşîn bêencam, hiştin û pîlan û kompiloyên şovenîst û panturkîstan bi ser îradeya aşî û pêşveçûna Turkiyê de biserket û dîsan serbarê nerazîbûn û aloziyan, pêlek nû ji reşbînî û gumanan derheq guhartina eqliyeta 87 salî a firçîkgirtî bi siyaseta înkâr û helandina vî gelî anî rojevê, ku carê zehmet e bi qazanca aşî û çareseriya yekcarî bê guhartin.

Lê niha fakterek dilixweşker û bihêz heye ku heya qasekê hêvî, aramî û vejenê dide mirov, ew jî raya giştî ya Turkiyê ye ku hest bi vê êş û azara ev birîna dijwar û kûr ya Turkiyayê dike ku renge çî din taba van janan negre. Lewra hewcehî bi çareserek lezgîn heye. Çunku li midehê 30 salên derbazbûyî de xincî xwînrijî û gorîdanê tu armanc û serkevtinek siyasî û leşkerî misoger nekiriye. Lewra Jî tevîbûna Ufuk Uras, Parlamentarê serbixwe yê Turk li Stembolê bi girûpa BDP'ê, li cihê xwe de eyenkerê guhartina raya giştî ya Turkiyê ye ku çareseriyek aşîyane û demokratîk dixwazin. Lêniherînek bi wan bûyerên vê dawiyê re, eyan dike ku ew cehd û xebat û pêngavên AKP'ê li ser pîrosesa Vebûna Demokratîk heya niha pitir dişibine taktîk û makyajê heya pirojeyek bi bername û stratejîk bi armanca çareseriyek guncaw. Çunku dihat çawnihêrî kirin Partiya desthilatdar li hember daxistina Partiya mixatebê Kurd (DTP'ê), gelek micd û rijsd helwestê ji xwe nîşan bide.

Ji ber wê ku him ji piştewaniya navxweyî a Kurdan, aşîxwazên Turk û him jî pitgiriya derveyî weke YE û Amerîkayê bimifah bû, lê bi mehkûmkirinek bitirs û vala û şibandina Turkiyê bi goristana Partiyên siyasî û ji hêla din jî domandina operasyonên nevwexyî, girtin û binçavkirina şaredar û endamên BDP'ê û berdewamiya çavşoriyê ji aliyê hikûmetê ve, zêdetir guman xiste ser gavên nivîşkan yê xwe lîdor pîrosiya "vebûna demokratîk".

Lê wekî xuya AKP'ê bi vê yekê du armanc şopandibin. Yekem bihêzkirina pêgeha partiya xwe li deverên Kurdakincî de ku li hilbijartinên şarevaniyê li 2009'an de bi awayekî berbiçav dengên xwe jidest dan û paşan jî bi dana hin mafên sereke, derfet û delîvêya jinavbirina xebata çekdarî û siyasî a Kurdan pêk bîne û bi vî awayî pêgeha hikûmeta xwe li asta navxweyî, deverî û çîhanî de bilind bike. Diyar e serbarê vê ku ferq û cudahiyeke zaf li dîtin û ramanên AKP'ê derheq pîrsa Kurd bi nisbet Partiyên Statukparêz yê CHP û MHP'ê de heye û AKP nermrew û hinek vekirîtir difikire û dilive, Kurd jî baştir dikarin tevî AKP'ê lihev bînin heya aliyên dinê. Lê eva jî eşkere ye ku bi fend û fêl û xapandinê, demokrasî cihgir nabe. Ji ber ku tenê sivrîn li dora xwe û ducarkîkirina dîroka pîrs ji tirajîdî ye.

Ji aliyê dinê jî xwedî û mixatebê dozê anku Kurd, serbarê vê ku xebata çekdarîya wan bi tawan û li çarçoveya terorê de cih didin û ji awira din ve jî xebata siyasî û sivil jî jê qedexe û berbend dikin, lê îrade û vîna biratî, aşîxwazî û demokrasîxwaziya Kurdan hertim serdest û li xurtbûnê de ye. Serbarê asteng afirandin û bêhêvîkirina wan, lê dîsan nehiştin ku hêviyên şovenîst û neyaran bi cî bînin. Me dît ku gelek realîstane û berpîrsiyarane derbasî Partiya Aştî û Demokrasiyê (BDP'ê) bûn û ji rêya vî partiyê û parlamenê ve xebata siyasî a xwe didomînin. Lê dîsan em dibînin ku eva eqeliyeta berteng û genî ya parek ji desthilatdarên Turkiyê ye ku naxwazin aşî, ewleyî û tenahî bi ser alozî, şidet û şovîniyetê de bi ser bikewe û siya azadiyê bi ser esmanê wî welatî de cihgir bibe û hevkeşe û pêvajoya bûyeran jî rewenda asayî û demokratîk a xwe bipîvin. Berevajî em dibînin ku bi



daxistina DTP'ê, ne tenê dawî bi dijberî, girtin û binçavkirinê neanîne, belkî dixwazin ew armanc û deskevtên ku li daxistina DTP'ê de bidest nexistin, carek din bi givaş xistine ser BDP'ê û girtin û kelebçekirina ew şaredarên ku nûnerên îrade û vîna gelin, wan armancan bişopînin. Bêşik misoger kirina van armancan jî li domandina tundûtûjî, alozî û darbelêdan ji hewlên çareseriyê û vejeriyana bo siyaseta îdeolojiya berê ya xwe de dibînin. Li vê derheqê de Çengîz Çandar li rojnameya Turkî a Radîkal de nivîsandiyê ku "girtin û kelebçekirina şaredar û endamên BDP'ê, nîşaneya berçavnegirtina îradeya gel û mayîn (mîn) danan li ser rêya pêşveçûn û pirojeya vebûnê ji aliyê hikûmetê ye ku dixwazin wan kurdan ji derfetên yasayî û demokratîk dûr bikin, heya ku bi neçarî rêya çiya bigrin pêşberî xwe"!.

Lewra Hikûmeta AKP'ê divêt bizanibe ku bi vê siyaseta îradeya zext û zorê, çavşorî, binçavkirin û birina bi darê zarê bo berdadgehê, ne tenê tu serkevtinekê misoger nake, Berevajî, li egera berdewamiya vî siyaseta îradeya de, AKP dê li deverên Kurdistanê de tûşî derdê MHP'ê û CHP'ê bibe, şidet jî dê xurt bibe û li qada navneteweyî û bi taybet ji mêzgeha Ewropayê ve dê zirarê bibîne. Lewra rêya herî baş û jêhat, micidbûn li ser berdewamiya pîrosiya Vebûna Demokratîk, sekinandina operasyonan û guhartina Yasaya Bingehîn ku makeya hemû tirajîdiyan e û bi guhartina wê jî, yekêtiya Turkiyê garantî dibe.

Şiroveyek Derheq Bûyerên Vê Dawiyê Ên Îranê

Hiloşîna Kela Zordariyê Nêzîk E



Silêman Keleşî

Li destpêka hatine serkar a Komara Îslamî ya Îranê heya niha, hertim li nava desthilatdar û rêberên wê de dijberî û nakokî hebûye. Her

li dema karkirina dewleta demî ya Mihendis Bazergan ve heya dema Benîsedir, wekî yekemîn Serokkomarê Rejîma Îslamî a Îranê. Ew dijberî û nakokî bi qasekê kûr bûn ku Benîsedir li Serokkomariyê hate vêdebirin. Herwiha melayên tundrew bi piştewaniya Xumênî karîna hemû hevber û alîgirên Benîsedir û dijberên xwe bi awayên curbicur tepeser bikin, li meydana derxî û gişt desthilatê bigrin destê xwe. Şerê Îran û Îraqê derfetek baş bû ji bo meleyên tundajo bi rêberiya Xumênî ku bi vê sedemê karîna bi sanahî gişt azadî û mafên mirovan bînpê bikin. Herwiha gişt dijberên xwe ji kesayetiyan rexnegir ve bigre heya digihîje kesên dijberî rejîma Komara Îslamî û Wilayeta Feqîh ji holê rakirin.

Eva jî bû sedem ku rexnegir û dijberên rejîma Îslamî ya Îranê nekarîna li welat de bimînin û bi awayek demokratîk kar û xebata xwe bimeşînin. Xumênî û darûdestên wî hemû rêyên demokratîk li ser opozîsiyon û rexnegiran girtin. Take rêya ku ji wan re bi cih ma, ewa bû ku yan teslîm bin yan jî neçar bi berbirûbûn û şer bibin. Di encam de Hinek ji rêxistin, Partî û kesatiyên Siyasî teslîm bûn û hejmarek din jî wek Mucahidîn Xeliq û paşan jî Partiyên Kurdistanî ji rêya xebata li dijî rejîmê hilbijartin ku heya niha jî didome. Rejîma Îranê jî bi nasandina wan Partiyên wek "Munafiq", rê ji bo tepeserkirina wan xweş kir û dest avêtin girtin, kuştin, teror û qirkirina wan, ku heya qasekê jî di wî karî de



biserketin.

Komara Îslamî, Îran kire zîndanek mezin ji bo fetisandina her dengê nerazî û hawarek azadîxwaziyê. Lê bi vê siyasetê ne tenê nekarîna şerê navbera desthilat û nerazîbûna xelkê azadîxwaz bi tewahî bi dawî bûn, belkî dijberî û nerazîbûn hertim wek borkanekê di nav Îranê de germ û bihêztir dibû. Piştî hilbijartina gera 10'mîn a Serkomariyê, ew borkan teqiya û xîmê 30 salî yê Komara Îslamî bi tundî hejand: Rêber, Hikûmet û sîstem jî bi tewahî bire bin pirsiyarê.

Ger em niha bizava nerazî a piştî hilbijartinê pênase bikin, divê bibêjin ku ew tevger, ji kesatiyên rexnegir û reformxwazên nava hikûmetê ve bigre heya nerazî û dijberên yekcarî ên sîstem û hikûmeta Îranê li xwe de cih daye.

Mirov dikare vê tevgerê bo ser du beşan cuda bike. Yekem: Alîgirên Kerûbî û Musewî ku bîngeha sîstema desthilatdar dipejirînin û tenê dixwazin Ehmeînîjad li ser desthilatê nemîne û ew bêne cihî wî û hin guhertinan li siyaseta derve de bikin. Lê ew girûpa qet naxwaze sîstem û Wilayeta Feqîh li xîm da biguherin. Girûpa duhem jî ku di bin çetra bizava kesk de dirûşmên "mirin ji bo dîktator" dibêjin, yan wêneyê Xamineyî û Xumênî pêpes dikin û didîrînin, dixwazin hikûmet û nîzama jî holê rakin. Heta Mûsewî û Kerûbî jî, vê girûpê napejirînin û mehkûm dikin, herweha xwe girêdayî bi rêbaza Xumênî didin zanîn. Lê ew jî dixwazin ji kesên neyar ên rejîmê bo çibçikîrîna xwastekên xwe wek alavekê mifahê bistînin. Girûpa ku bi navê reformxwaz tevî bizava nerazîbûnê bûne, xwe wek beşek ji hikûmetê dizanin.

Lê desteya din pîrrianiya xelkê pêk tîne û bi tewahî li dijî hikûmet û sîstema Komara Îslamî a Îranê ne û ji gişt bîr û hizrên curbicur wek çepgir, rast, demokrat û xelkê nerazî pêk tînin.

Girûpa duhem pîrri bi başî karîna ji Mûsewî û Kerûbî mifahê bistînin. Xelkê nerazî li bin sîbera mirovên nîzama desthilatdar de tabo û tilîsma tîrs û kela hovîtî a 30 Salî ya Komara Îslamî şikandin û bi Milyonan xelk hatin ser şeqaman. Herçend rojên yekem xelk bi tîrs ve derketin kolanan û gotin "em dengê xwe dixwazin". Paşan bi şikana tîrsa wan, hêdî hêdî xwastên radîkaltir anîn ser zîman û bi dana dirûşmên wek mirin ji bo Xamineyî û Komara Îslamî û



dirrandina wêneyên Xumênî û Xamineyî, rejîma Îranê birine bin pirsiyarê. Karek ku heya şeş mehan berî niha nemumkin bû.

Bi giştî vê tevgerê niha hemû bîngeh û xîmên rejîma Komara Îslamî hejandi ye û tîrsek mezin xistiye dilê desthilatdaran. Lewra ger heya niha rejîma Îranê tenê tevî Opozîsiyona derveyî sînor berbirû bû, lê îro rojê hikûmet û nîzam bi dijberiya bizavek milyonî a pêkhatî ji hemû tex û qatên civaka Îranê rûbirû ye ku serbarê bikaranîna hemû metodên tepeseriyê ji aliyê sîstema desthilatdar ve, nekarîna meydana ji wan bidin betalkirin. Ya herî girîng eva ye ku îrorojê tu mercei, organeke hikûmetî, olî û qanûnî îdî ew qodsîyet û berheqbûnê caran bal xelkê nînin ku bikare bo çareserkirina kirîza heyî hewlê bide. Lewre hikûmet ji dest daye, niha ku piştewaniya xelkê roj bi rojê rawatî ya xwe li nav dem û dezgehên hikûmetî de jî ji dest dide.

Dijkiryara hikûmeta Komara Îslamî a Îranê li hemer xelkê bêberevan, anku girtin, tepeserî û kuştina xelkê bûye sebeb ku ev rejîma li asta navnetewî de jî zêdetir bikeve bin zext û givaşan û roj bi roj îzole û tenêtir bimîne. Hikûmeta Îranê hêdî hêdî berev nemanê diçe, çimku Rejîma Komara Îslamî piştewanê xwe ên sereke anku xelkê Îranê ji dest daye û tu berheqbûnek bona desthilatdariya vê rejîmê nemaye.

Tiştê herî hewce û girîng ji bo gelê Kurd bi giştî û bo partî û rêxistinên Kurdî nemaze, eva ye divê di zirûfa han de xwedî çî rolekê bin û çî siyasetekê peyrew bikin?

Hêvî dikim ku tev Partî û aliyên siyasî yên Kurdistanê bi awa û siyasetek îroyîn û rast û stratejîyek diyar bi hevahengî tevî bizava azadîxwaz a gelên Îranê ji bo hiloşandina herçiqas zûtir ya kela zordariyê û avakirina Îranek azad, demokratîk û Federalî bixebitin

RONÎ

Quncikek ji bo şiroveya bûyer û babetan ji xwendevanên "Agirî" re

Ebdulla Hicab



Riya bi xwîn

Li kolanên bajarên Îranê dubare xwîn diherike. Dîsan hawar li dijî zulmê bilind e. Dîktator heman dîktator e. Şeweyên serkûtê, heman şewê ne. Hêcet, heman tişt e. Qurbanî, xelkê bê berevan e. Bikujên tēniyê xwînê, sinûrê çavrosiyê nas nakin û li her ku û her dema rexnegirek dîtî, yekser heta dawî dajone ser. Di heman demê de ku laşê lawan dikeve ser kolanên sar û sir yê bi seqaya zistanê cemidî, kela zulm û zordariyê gav bi gav pitir dilerize û her ku zeman diçe, qelîşkên tê ketî firehtir dibin. Bi lêketina zengilên mizgînhînerê lerizîna sitûnên Wilayeta Zulmê, dîktator weke marê birîndar, hovane bi rast û çepê xwe vedide.

Bûyerên meha Muherem û bi taybet roja Aşûra ku ji bo bisilmanên şe rojek pir pîroz e û bisilmanên din jî di hember de bi hûrmet tev digerin, dubare nişan da ku Komara Îslamî, dîn tenê weke emrazekê ji bo parastina desthilata siyasî ya xwe bi kar tîne. Di wan rojan de, ji zanîngehan û kolanên bajarên re bigre heya Mizgevt û malên rêberên ayînî yê ku dîtinek cuda ji ya Welîyê Feqîh hene, li her devera ku kesek an komelekê carekê gazindeyek ji deselata Xamineyî û Ehmedînijad kiribe,, topizê zordariyê li hindavî serê xelkê bêberevan diheje. Êdî dubare derket ku rêberên Komara Îslamî re tu maneya nixirê olî û rojên pîroz nîne. Ev bûyer di heman demê de ku durûtiya rêberên rêjîmê nişan da, bû destpêk ji tevgerê nû re ku ger bixwaze jî, êdî nikare di çarçoveya Komara Îslamî de ji guhertin û sererastkirinê bigere.

Piştî wan bûyeran, niha jî êrîşa bo ser malên Ayetullahên ku bi Xamineyî re yekdem nînin, dest pê kiriyê. Pêşdar û besicên girêdayî bi sistemê, tenê bi bêhurmetî kirin nixir û pîvanên olî nasekinin û niha dest avêtine bi serdegirtina malên rexnegiran, girtina bi sedan xebatkarên tevgera xwendikaran, û çalakên medenî û xelkê sivîl.

Her roja ku derbas dibe, Komara Îslamî pitir şewekar û metodên Nazîstan li hember dijberên xwe de bi kar tîne. Hîtlêr êrîşa li hember cihû, sosyalîst, hêzên çep û rexnegirên xwe, bi êrîşa şeva 9/10ê heyva Novembara sala 1938, ku bi şeva Krîstal, **die Kristallnacht**, tê naskirin, destpêkir. Tê gotin ku di wê şevê de li Alman û utrîşê (Aûstria) bi kêmî 200 kesên cihû hatin kuştin, 267 Kenîse hatin şevitandin, 7500 dukan û nawendên bazirganiyê hatin talan

kirin û bi dehan hezar cihû hatin girtin û derbasî kampên îşkence û zordariyê hatin kirin. Ev bûyer bû destpêka meşa Hîtlêr ber bi komkûjiyên herî reşe dîrokê ku tenê bi girtin û kuştina cihû û sosyalîstan bi dawî nebû û bi xwe re şerê cihanî yê 2 yê anî û di dawiyê de bû sedema kuştina pitir ji 50 miliyon kesan.

Komara Îslamî, şeva xwe ya Krîstal bi fermana cîhada Xumênî li dijî gelê Kurd li roja 19'ê Augusta sala 1979'ê dest pê kir. Piştî her bi wî rengî hêzên serkûtker çûne ser hêz û partiyan ku pîvanên Wilayetê Feqîh li dijî demokrasîyê didîtin. Girtin û kuştinan, sinûrê hovîtiyê derbas kirin û Komara Îslamî bi kuştin û zordariyê hemû dengên rexnegir fetisandin. Lê xuya ye ku niha dîsan dîrok dubare dibe. Piştî her du pêlên xurt yê êrîşên rêjîmê li dijî azadîxwazan, niha pêla sêyemîn dest pê kiriyê.

Di gel ku pêşeng û siyasetvanên ku îro ketine ber xezeba Xamineyî û deselata reşe wî, heya duh beşdarî deselatê bûn û dîtî û ramanên Wilayetê Feqîhî parve dikirin, lê di rewşa îro de ev ber bi hindê ve diçin ku riya xwe ji ya deselatê veqetînin. Niha piştî 30 salan, beşek ji karbidestên pêşîne sistemê pê hesiyane ku Komara Îslamî armanca şoreşa gelên Îranê nebû, lewma li hember Wilayetê Feqîh, sistema girtî û hêzên serkûtker de serî hildane û daxwaza guherîna di çarçoveya rêjîmê de dikin. Ji bo aliyên ku ev 30 sal in ji bo guherîna têkoşinê dimeşînin, ev derfet verçerxanek nû ye. Di gel ku hender û pîvanên tevgera ku îro di hember rêjîmê de serî hildaye cuda bin û amancên vê tevgerê hemû daxwaziyan gelên Îranê negrin hûndirî xwe jî, lê xalên hevbeş hene.

Ev tevger bi hemû şeweyên xwe ve guhertinek nû, ber bi pêş ve û erênî ye, ji ber ku cewherê vê tevgerê her ku dem derbas dibe, pitir ji îdeal û amancên rêjîm û parêzerên wê cuda dibe. Heta eger bi tewayî bi îrade û xwesteka xwe jî nebe, lê bilez ji rêjîmê û îdelaên wê dûr dikevin û ber bi hindê ve diçin ku ev rastiya ku 30 sal berî niha gelê Kurd jêre bû qûrbaniyê yekê, bipejirînin. Her çend pir dereng be jî, lê ev rê veqetandin bi qazancê tevgera azadîxwaz û guhertinxwaz e û dikare weke kanalek nû ji bo bi pêşxistina bîra demokrasî û wekhevîyê bê bi kar anîn.

Rewşa îro ku li Îranê hatiye pêş, vegera ji bo rojên berî şanosaziya hilbijartina gora 10'ê ya Serokkomariyê nemumkin dike. Tevgera ku îro serî hilda ye, tu rê nînin

xêncî pêşveçûn û xwe bi daxwazên gelên Îranê re bi yek kirin nebe. Ev take bijareya ku li pêşiya tevgera nû heyî, Îranê ber bi rojên pir çarenûssaz ve dibe. Bi awayekê ku ji niha û pêve Welîyê Feqîh û parêzerên Komara Îslamî dikevin eniyekê û hemû aliyên din (eger ne bi xwestina xwe be jî) jî bi kiryar dikevin eniya dijber. Nişaneyên ku çend roje ji aliyê karbidestên rêjîmê tî, wê hindê erê dikin. Ji ber ku rêjîm niha tu cudahiyeke di navbera beşdarên tevgera nû û kesên ku bi sala ye daxwaza azadî û guherîna dikin, nabîne.

Tevgera nû, dema bi tewayî riya xwe ji ya Komara Îslamî cuda kir û girêdana xwe bi pîvan û nixirên demokrasîyê ve selimand, wê bibe lehiyek xurt ku dikeve hemberî hemû bal û taxmên deselata Komara Îslamî. Ev destpêka riya çarenûssaz e ku an wê ber bi azadî û wekhevîyê ve here û Îranê ji êş û azarên bi dehan salî rizgar bike, an jî dê bibe qonaxek nû ya kuştin û serkût kirinê.

Ezmûna 30 sal deselatdariya Komara Îslamî bi serê xwe bes e heya ku gelên Îranê û tevgera guhertinxwaz bernameyek alternatîv ji bo siberrojê amade bikin. Sistemên îdeolojîk ku tenê bi berçavkên reş û dîtînen tenge yê xwe temaşey bûyeran û pêvajoyên civakî dikin û mirovan weke emrazê xurtkirina îdeolojiyan xwe dihesibînin, bi her nav û rengên hebin, di dijberiya bi maf û azadiyên mirovan re hevbeş in. Deselata îslamiye Komara Îslamî, ya Sosyalîstiya Stalîn û ya Nazîstiya Hîtlêr, di gel cudahiyan bi ideal, durûşm û naveroka xwe, bi yek rengî rexnegirên xwe ji nav dibirin û weke hev bûn.

Di gel ku amancên tevgera Kurdistanê bi hemû daxwaziyan kesayetiyan pêşenge tevgera nû re bi tewayî yek nebin jî, vekirina deriyên diyalogê bi tevgera nû ya Îranê re pir giring e. Lê ji bo ku ev derî hem zû vebe û hem li ser civak û aliyê din bi tesîr be, pêştir pêwîst e hêzên Rojhilata Kurdistanê di nav xwe de lihevhatinek neteweyî pêk bînin. Dem dema bi serketina eqlaniyet bi ser hest û durûşmên kilasîk de ye. Pêdagirî li ser cudabûna dîtînan, berdewamiya dilêşan û rû ji hev zivirandinên caran, vegeşandina agirê netifaqiyan navxweyî û şiroveyên subjektîv an zeynî ji bûyeran, li dijî berjewendiyên neteweyî ne û pêwîst e bilez bi dawî bînin. Ger ji niha ve ev pêngav neyên rakirin, siberroj wê pir dereng be.

Vekirina Dergehên Demokrasiyê Bi Rûyê Kurdan Li Turkiyê



Rostem Cehangîrî

Hevdem li gel daxistina DTP'ê ji aliyê Dadgeha Destûrî ve, Serokê vê Partiyê Ehmed Turk û Aysal Tuxluk jî ji parlamenteriyê

avêtin. Bi vî awayî jî girûpa DTP'ê li parlamana Turkiyê de hiloşandin. Lê her wek dihat pêşbînî kirin, Parlamantarekî Çep ê Turk Ufuk uras, ku ji Kurdan nîzik e, li yekemîn roja daxistina DTP'ê de ragihand ku dê li nav Parlamane de tevî girûpa Kurdan bibe Bona ku bikarin carek din girûpa parlamani ji xwere ava bikin. Başiya Pêkanîna girûpan li wê de ye ku dikarin li hemû komîsyon û komîtên nav Parlamane de bibin endam û li biryaran de bandor û tesîra xwe hebin. Bi vê çendê jî Ufuk Uras bersivê baş da şovenîstan û Dadgeha bingehîn ku hemû endamên vê bi bîr û hizrên kemalîstî ve girêdayî ne.

Ufuk Uras ragihand ku tevî partiya Kurdan nabe, belkî tenê dê tevî girûpa parlamani be û nabe endamê BDP'ê.

Ev karê Ufuk Uras jî bi raya gelek rewşenbîr û siyasetvanan, bi gav û karekî zaf şoreşvanî û dostane tê hebsandin. Bi vî awayî jî diyar dibe ku tundrewên Turk nekarîne bigihîjne armancên xwe ku cudahiye bixin nav refên herdu netewên Turk û Kurd.

Ew du netewe dê bikarin pêkeve kar û zebatê bikin û pirsgerêkên navbera hev de bi rêyên demokratîk çareser bikin û nehêlin ku ev girêhişka sedan salî ku niha mijûlê vebûnê ye, carek din bê şidandin. Turk û Kurd çareserîya pirsgerêkê dixwazin.

Lê pirsiyar ev e, gelo çima Kurd dikevin telika wan pîlanên ku dujmin jêre dirrêje? Berevajî çand û kultora Kurdî dixwazin me hêrs bikin heya ku gotinên gorî dilê xwe bibihîzin û provaksiyanên bi metodên şidetê li dijî kurdan ber4siv bidin.

Mixabin li dirêjahiya dîroka me Kurdan de, hertim dujmin xwestiye me hêrs û tûre bike, da ku hemû deskevtên me jinav bibin, mixabin dîsan ev tişt ji mera dubare bû. Piştî daxistina



DTP'ê Ehmed Turk ragihand ku li ser daxwaza birêz Ebdula Ocelan ku niha li hepsê de ye vegeyriyan parlamane Turkan hesasiyet bi qisedana, wî hene lewre nedivîya Ehmed Turk li pêş ragehandinan ew tişt bigotiba.

Me got ku li dirêjîya dîrokê de rtim xwastine me tûre bikin ku bikarin ewa ku bi xwe dixwazin li ser me çibîcî bikin. Lewre nabe ku bi tu awayekê em tûre bin, çun ku zeman bê rehme.

Mafê Mirovan



**Nivîsîn: Peter R. Baehr
Wergeran: Mecîd Heqî**

Rola mafê mirov li siyaseta derewe de

Pelixandina mafên mirovan dikaribe bibe hegera sinûrdar bûn an qutbûna pêwendiyên di warê çand û sporê de. Ji ber wê ye ku ji bo demê dirêj gelek

welatan ji bo nîşandana dijayetiya xwe hemberî siyaseta apartayd li Afrîqaya Başûrî û ji bo çibîckirina biryarnamaya civîna Giştîye Neteweyên Yekgirtî nedixwast di gel wî welatî pêwendiyên han saz bikin. Ew siyasete li aliyê qurbanîyên apartaydê, xasmayî rêkxistinên respêstan wek Kongereya Netewiya Afrîqa dihat piştgirî kirin.

Lê bi berçavgirtina jîratîyê, niha gelek caran tê gotin ku qutkirina hemî pêwendiyên akadêmîk karek jîrane nebû, jiber ku rewşa han zortir dijî dijberên apartaydê şundaner bû, li halekê de ku alîgirên apartaydê bi her awayekê dixwastin biryarnameyên Neteweyên Yekgirtî nedîtî bigirin. Li hin pirsên din de hinek caran biryardan li ser şeweya duruste helwest derbirîne gelek zehmet bûye. Bo mînak nîqaşên gelek hatine kirin derbareyê wê ku gelo rêya perwerdekirina pisporên yasayî bo dadweriyê, mafnas, karbidest û xwendekaran bi welatîyên wan welatên ku mafên mirovan têde tê pelixandin bê dan an ne. Alîgirên wê yekê ku diviya ew rêya bêdan li ser wê bawerê ne ku li rêya perwerdekirina pisporan, ew dikare zêdetir agahdariyê li ser mafên navnetewîye mirovan peyda bikin. Dijberên wê yekê jî di wê bawerê de ne ku rêdan bi perwerdehiya pisporan bi awayek nerasterast piştgirî li hikûmetên totalîter e. Çawçeskoîyê Romanî yek ji mînakên wan pirsên cihê nîqaşê bû ku gelo pêwendiyên nawnetewîye çandî digel Romaniya wê bibe hegera wê yekê ku rejîma Çawçesko wê domdar be an wê alîkariya dijberên wî bike. Li rewşek wilo da herdu aliyên alîgirên pêwendiyên çandî û dijberên pêwendiyên çandî xizmetê bi armancek hevbeş dikin: Baştirkirina rewşa mafê mirov. Lê ew li wê ku çî rêyek bê hîlbijartin, gelek dîtînen dijhev hene.

Sizadan

Pêngavên hatî bas kirî hemî bi wê girêdayî ne ku çî karek belkî dostane an helwesta "nêrm" bê dîtî. Înstîrûmêntên herî zor cihê nîqaşê baykotkirin an sizadan e. Dewlet xwazyarê wê yekê nînin jiber ku baykot dikare zirarê li wan dewletan bixwejî bide. Bo mînak ji bo ambargoya çek û çolan dijî Afrîqaya Başûrî gelek dewletên rojava piştî wê ku Şewra Tenahiya Neteweyên yekgirtî biryar da piştgirî li ambargoyê kirin. Dewletan xwe pişt wê hêcetê diveşartin ku: "ger em nekin, wê dewletek din bike". Ji bilî wê yekê şundarbûna ew ambargoyane jî gelek caran cihê pirsyarê bûye. Ew kare belkî bibe hegera zerer kirina kesên şaş an jî bibe hegera hesta dijberî û rewşek ne erênî. Li dema bas ji ambargoya petrolê li ser Afrîqaya Başûrî, nîqaşek bi wî awayî dihat kirin.

Lewma jî bas kirin û peydakirina rêyek biar bo pêşvebirina mafên mirovan ji aliyê ew kesên ku li rewşek abûrî û siyasî ya din de dijîn, gelek zehmet e.

Bas li ser ambargoyên abûrî pirsek kevn e. Gelo ambargoya petrolê dijî Afrîqaya Başûrî dikaribû alîkariya pêşveçûna xebata dijî apartaydê bike? Belkî bandor û cihwarek zû nebûye, lê karê han dikarî bibe hegera lawaz bûna sistemê û zêfkirina bingehên rejîma hakim. Di wê rewşê da dijberîya navnetewî digel apartaydê dibe hegerê zêif bûna wê. Lê çarenivîsa wê û biryara wê ku çî rêyek diviya serkeve, girêdayî ye bi xwasta xelkê Afrîqaya Başûrî.

Hilkevt û Bone Dibin Bela Serê Wan



Azad Kurdî

Di 30 salên borî li Îranê de, bi kêmî dihat xuyakirin ku nerazîbûnên xelkê bi vî awayê ku niha dimeşin, dakevin ser rê û şaqaman. Ev

meş û nerazîbûnên girseyî ên xelkê nerazî, tirs û xofeke mezin xistiye nav dilê desthilatdarên dîktator û her derfet û boneyek dibe qada xwepêşandan û nerazîbûnan. Ji berku dezgehên qirker û dijîgelî hemû cure çalakî û meşeke sivîl û aştxwazane ku têde desthilat bikeve ber rexneyan, qedexe dikirin û dikin. Ev tiştê sirûştî ye, çûnkî ew taybetmendiya hemû desthilatdarên dîktator e û her ev yek jî li karbidestên îdeolojîk yê Wilayeta Feqîh dihat û tê çaverêkirin. Sedem jî ew e ku rejîma wan tu bingehek demokratîk û rewata tune û pêkhata dîktatorane a rejîma Komara Îslamî wê rastiyê derdixole. Ji roja yekem a bidestgirtina desthilatê, karbidestên îdeolojiya Wilayeta Feqîh bi kiryar nîşan dan ku ew li dijî hemû azadiyên demokratîk û yek ji wan azadiya civîn û kombûnên aştxwazane ne.

Vê rewşê hemû azadîxwaz û xebatkarên demokrasîyê li Îranê de diêşîne û hêrs dike ku xelkê di civakê de heta mafê lidarxistina kombûnên sivîl û qanûnî jî tunebin. Herdem jî îdea kirine û dikin ku rejîma wan a paşverû hikûmeteke îdeal di cîhanê de ye! ku hemû azadiyek ji bo takekesan dabîn kiriye! Ligel vê rewşa zal bi ser Îranê, carek din xelkê nerazî û azadîxwaz, bi



taybet Kurd jî berdeham xwenîşandanên aştxwazane nesekinîne, lê hercar civînên xelkê bi rijandina xwînê, girtin û bêserûşûnkirin, îşkence û cezayên giran ên girtîgehê ji wan re bi dawî hatiye. Lê êdî piştî 30 salan xelk westiya ye û ragihandina encamên şanogeriya îsal a diyarîkirina Ehmedînejad bû derfetek bo xuyakirina hêrs û nerazîbûnan û herçiqas pêşdîtin nayê kirin, lê piraniya pispor û xebatkarên siyasî dibêjin, pêvajoya ku niha di Îranê de dest pê kiriye, naverge rewşa bédengiya berê û tirs û xofa xelkê hatiye şikandin û biwêrî û netirsî wan ber bi pêşerojê geş û ronak û rizgarbûna ji destê desthilata dîktator han dide.

Piştî ragihandina encamên şanogeriya gera dehema hilbijartinên Serkomariya îsal di Îranê de, êdî xelkê nerazî û bêzarbûyî ji fend û fêlên desthilata zordar ya Komara Îslamî, dawî bi bédengî li hember zulm û binpêkirina maf û azadiyên xwe anîn û pêvajoyek nû destpê kirine ku di 30 salên borî de di asta sernaserî de bînimûne bûye. Vê pêvajoyê tirs û xofek mezin xistiye nav dilê desthilatdarên Wilayeta Feqîh û êdî bi êşkera ketin dijberî û qirkirina tevgera nerazîbûna xelkê. Ji her tiştî balkêştir ew e, ji bo xweveşartin ji rastiyan, li gor ramana taybet û edetê dîrokî ku di dîroka hemdem ya Îranê de herdem hebûye ku têde sebebkarê bûyer û xwenîşandanên Îranê welatên derve zanîne, îsal jî Amerîka û Bîrîtanya û bi giştî Rojava wek sebebkarên wan meş û nerazîbûnên girseyî ên xelkê bêzarbûyî yê Îranê hatin zanîn ku daketine ser rê û cadeyan û dirûşman li dijî dewletê diqîrînin.

Xala herî balkêş di vê pêvajoyê de ew e, ji ber ku desthilata dîktatorî a Komara Îslamî rê nade civînên giştî û xwenîşandanên aştxwazane werin lidarxistin û ji hemû civîn û nerazîbûnekê bi guman in, lewar bi tevahî kombûnên xelkê ên berfireh di seranaserê Îranê de qedexe ye. Bi taybet di wan bajar û herêman de ku neteweyên Îranê nemaze Kurd lê dijîn. Lewra xelkê nerazî neçar maye ku ji van hilkevt û boneyan bo xuyakirina nefret û bêzarî û nerazîbûna xwe mifahê bistînin ku dewletê bixwe diyarî kirine û piranî hilkevt û boneyên olî û siyasî ên taybet bi rejîma Komara Îslamî ne ku îsal bûn qada xwenîşandanên berfireh ên xelkê nerazî.

Ji boneyên wek Roja Quds, Roja Mamoste li Îranê bigre heta digihîje hilkevta koçbarbûna Muntezirî û di çend rojên borî de rêûresmên roja Tasûa û Aşûra ku boneyên olî jî bûn, Di hemû wan hincet û munasibetan de, xelkê nerazî ketin ser rê û cadeyan û bi dirûşm û meşên dirêj û berfireh vîn û îradeya azadîxwazî û demokrasîxwaziya xwe ji desthilatdarên zordar re dan xuyakirin. Ji ber alozî û tevlihevbûna rewşa hundirê Îranê, Komara Îslamî ger pê çêbiba tu bone û hilkevtek bibîr nedianî û rêz ji wan nedigirt, ji ber ku hemû ew hincet bûn qada xuyakirina nerazîbûnê li hember desthilata dîktatorî û roj bi roj dirûşmên xwepêşandan radîkaltir dibin. Wisa dixuye ku ji ber rênedan bi lidarxistina meşan, bone û hilkevten diyarîkirî ên desthilatdariya Wilayeta Feqîh bixwe bibin bela serê wê rejîmê. Bi êşkera dixuye ku tirs û xofek bêrade ji bone û hilkevta bi taybet ên olî ketiye nav dilê wan.

Bo Kêmkirin Seha Seksî, Keçên Kurd Tê Sunetkirin



Hemid Muxtari

Dema ku min bo yekemîn car nûçeya xetenekirina keçan yan biserhetên wan di vê derheqê de li malperên înternetî, rojname û kovaran

de xwend, ez pîr ecêbmayî û xembar bûm û kezeba min ji bo wan keçan şewitî. Mixabin pîr kêma in nawendên ku di vê pêwendiyê de kar dikin û hewla kêmkirina asta vê diyardeyê di nava civaka me a kurdewarî de didin.

Renge em nekarin di vê gotarê de bi hûrî vê diyardeyê analîz vekelîştinek civaknasî û zanistî di vê pêwendiyê de pêşkeşî we bikin, lê emê hewlê bidin di vê nivîsarê de li ser hin xalên girîng bisekinin.

Îrorojê sunetkirina keçan di asta Kurdistanê de tenê di Kurdistana Başûr û beşek ji bajarên Rohhilatê Kurdistanê wek devera Hewzamanê û hinek deverên Parêzgeha Azerbaycana Rojava tê birêvebirin. Pîrriyaya kesên ku bawerî bi encamdana karê han hene, ola îslamê ji xwe re dikin mertal û dibêjin eva biryarek olî ye. Lê virde pîrsek tê holê, gelo ger sunetkirin, biryarek olî ye, çima sunetkirina keçan tenê di hinek beşên Kurdistanê de tê encam dayîn û gişt xelkê Kurdistanê vê kiriyara dûr ji mirovahiyê çibîcî nakin? Xwe pîrriyaya Kurdan pêrewê ola Îslamê ne, ger eva jî yek ji biryarên Ola Îslamê be, çima ew pîrriyayê peyrewiyê lê nakin?

Li gor van lêkolînên ku hatine encamdayîn, xetenekirin ne destûrekî olî ye û di Qurana Pîroz de tu basek ji sunetkirina keçan nehatiye kirin, belkî li gor wan lêkolînên ku di vê pêwendiyê de hatine encamdan, dîroka vê diyardeyê vedigere bo 2000 salan berî sala zayîne di welatê Mîsrê de. Belge û senedên herî kevin û berdest jî peyda kirina ew jinên Misrî ên mûmiyayî kirî ne ku kilîtorîsa wan hatiye birîn. Hirodot, dîroknasê Yûnanî, bûna vê dab û nerîtê di navbera Misriyan de vedigerîne bo 5000 salan berî zayîne. Ew hirwiha dibêje ku Romî, Ityûpî û Fîniqî jî keçên xwe sunet dikirin. Ew dab û edeta ji welatê Mîsrê ve bo welatên din yê Afrîqayî û Asiyasî û Erebi hatiye veguhastin û cihê xwe girtiye. Herçend ku niha welatê Mîsrê sunetkirina keçan qedexa kiriye, lê niha



ji zêdeyî 90 ji sedî ya xelkê vî welatî keçên xwe sunet dikin.

Li gor gotina Turaya Ehmed Ebîd, berpirsa Saziya Nifûs a ser bi rexistina Netewên Yekbûyî, di çihana îroyîn de 120 heya 140 milyon jin hatine sunetkirin û rojane zêdeyî 6 hezar keç li seranserê cihanê tên xetenekirin.

Li Başûrê Kurdistanê sunetkirina keçan jî sedî 60 e û eva jî serhejmariyek pîr zêde ye. Herçend ku ev serhejmariya jî bi tewahî ne rast e û tê gotin ku zêdeyî %60 ji keçên Kurd li Başûrê Kurdistanê tên sunetkirin, lê çimku xetenekirina keçan li gor yasaya Hikûmeta Herêma Kurdistanê, karekî dijî yasayî tê hesêb, lewra ev kare bi veşartî tê birêvebirin û mirov nikare serhejmariyek serrast bidest bixe.

Bakgirawenda zihnî a li pişt xetenekirina keçan li Kurdistanê:

Pîrriyaya kesên ku li Kurdistanê keçên xwe sunet dikin, bawer in ku xetenekirina keçan garantiya namûsa wan dike, çunku hesta seksî a wan kêma dike. Ji aliyekî din ve kesên han sunetkirina keçan wek karekî saxlemî dizanin, çimku ew bawer in kilîtorîsa jinan, tiştê kirêt û ne paqij e û heta nanê destê jinên ku nehatine sunetkirin jî naxon û dibêjin nanê destê jina xetenekirî heram û ne paqij e. Herwiha vî karî wek biryarek olî dizanin.

Lê di rastî de her wek me li serê îşare pê kir xetenekirina keçan ne biryarek olî û ne dab û edeta kurdewarî ye. Belkû kultora han ji welatên

Afrîqayî ve bo Kurdistanê hatiye veguhastin û armanca sereke a vê kiriyarê kêmkirina seha seksî a keçan e.

Mixabin paremayîbûna civaka me, nexwendewarî, sîstema mîrserdes û hejarbûna xelkê di warê aborî ve bûye sebeb ku civaka me a Kurdewarî bi çavek sivik û biçûk mîzeyî regeza mê bike û wan tenê wek alavekê bona têrkirina heza xwe a seksî bikar bînin.

Divê bibêjin ku xetenekirin bandorên nîgetîv ên pîskolojîkî û cîsmî dixê ser keçan. Serbarê vê yekê ku êş û azarek zêde heye, bi qasekî zor seha seksî a keçan kêma dike û ew dibin alavek bona têrkirina seha seksî a mêran û bi xwe tu xweşiyekê di pêwendiyên seksî de nabînin û pîr bi kêma digihîjine asta orgasmê.

Em çî bikin daku bikarin vê diyardeyê di civakê de ji nav bibin û nîfşên piştî me îdî nebin goriyê vê diyardeya biqirêj. Diyardeyek ku yek ji metodên tundûtûjîyê li dijî jinan tê hesêb. Hewceye ku civaka me ber bi civakek sîvil bimeşe û ragihandinên Kurdî nemaze Tv bihayek girîng bidin vê pîrsê û bi hişyarkirina xelkê, civakê ji rêya sîstemên durust ên perwerdehiyê tê bigihîjînin ku ev diyardeya karek kirêt û dûr ji exlaqê mirovî ye û encamên xirab dixê ser civakê. Be raya min tenê jordecûna asta xwendewarî di sîstemek durust û îroyîn û pêşkevîna civakê di warê aborî, çandî, siyasî û yasayî dikare vê diyardeyê di civaka me de jînav bibe.

JIYAN

ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com



Heyîn û heyberên jîndar bi zayîne dest bi jiyane dikan. Bi vegotîneke vekirîtir, jiyane bi zayîne dest pê dike. Zayîn; di wateyêke teng de

wekîbûyîn, welidîn, weladet, çêbûn, jê bûn, jê çêbûn hilatin, derketin, pêkhatin an jî welidandina heyberên ku li gorî rêbazên xwezayê dizên, tê ravekirin. Mirin; di wateyêke teng de wekî tunebûn, ji holê rabûn, ji dest çûna jiyane an jî wekî bidawîbûna temenê heya, tê ravekirin.

Xweza; ji wateya wê ya bêjeyî jî tê fêmkirin ku ew jî xwe bi xwe za ye. Ango, xweza, hem xwe hem jî heyberên ku di koşa xwe de hilandiyê, diwelidîne. Bi awayekî din mirov dikare bibêje xweza, hem ji xwe re û hem jî ji tevê heyberên din re dayîkiyê dike.

Zayîn, tenê ne nasîn û hevnasîna xwezayê an jî destpêka jiyaneke nû ye. Mirin jî, tenê ne jidestçûna jiyane an bidawîbûna temenekî kin e. Ji bo wê mirov ne dikare her car zayîne wekî bizav, vebizav, hilfirîşkin û lihember derketina xwezayê bibîne û ne jî mirinê her gav wekî lêvegerandin û radestketina wê. Lewre xweza digel welidandina hemû heyberên heya, dijmin û dijberên xwe jî diwelidîne. Dijminê xwezayê yê herî hêzdar û qedîm mirov bi xwe ye. Mirov reaksiyaona xwe ya sereke li hemberî xwezayê nîşan dide. Ew reaksiyaona sereke jî zayîn e. Belê hin caran jî mirin e. Zayîn, hem jidayîkbûna giyanberan a ku bi dilovaniya xwezayê re pêk tê ye û hem jî pozberiya wan a ku li hember xwezayê dest pê dike ye. Mirin jî... Lewre mirin jî reaksiyoneke xurt e li hemberî heyînen ku dixwazin jiyane di bigirin.

Heyberên ku di xwezayê de ji dayîk dibin dîsa bi xwezayê re dikevin nav rikberiyêke giran û pêre şer dikan. Li gorî biwêja kurdî ya "jê keto pê keto" rewşa zarokên ku ji dê û bavê xwe dibin û peyre bi wan dikevin, pir dişibe rewşa heyberên ku ji xwezayê dibin û peyre li hemberî wê derdikevin. Mirov bi xwe jî di nav de, tevê giyanwerên heya pêşî ji xwezayê dibin belê dîsa li hemberî xwezayê derdikevin û pê re şer dikan.. Bi rastî her çend ku ev yek wekî nakokiyêke gewre bê dîtin, jî dîsa rêbazêke xwezayî ya jênager e.

Riknê hebûn û domdariya xwezayê û rêbazên wê li ser van nakokî, dijberî û dijayetiyan ava bûye. Di xwezayê de, her tişt bi dijberê xwe û bi dijminê têkûz dibe û dikemile. Bo nimûne: Dijmin û dijberê

zayîne, mirin e.

Belê jiyane bi mirinê watedar dibe. û mirin jî bi jiyane. Li aliyê din her heyîn, dixwaze hebûna xwe bi tunekirina heyîneke din bide selmandin. Yanê her heyber bi dijberê xwe an bi dijminê xwe re diwelide û hebûna xwe didomîne.

Derbasbariya zayîne, tenê ne ji bo heyberên jîndar an heyînen daringî(madî) ye. Gelek raman, têgih, rêman, bûyer û lêqewminên xwezayî jî bi zayîn û mirinê rûbirû dimînin. Her wekî din kom, komel, civat, civak, çand, çin, ol, dîrok, netewe, xuhermend(hikûmet) dûgel(dewlet) û şahînsahiyên(împaratoriyên) dinê jî bi zayîn û mirinê re nasdar dibin.

Zayîn û mirina van têgihan jî dişibe ya mirov û heyberên din. Ew jî wekî hemû heyberên ruhber, pêşî dizên, bi ser piyan dikevin, dimeşin, dilezin, dibezin, digihên, distewin, dikemilin dipersin, diwestin, (car caran nexweş dikevin) pîr û kal dibin, ji hal dikevin, ditemirin û saxî jî dimirin.

Şarîstaniyên mirovahiyê jî wisa ne. Ew jî di yek bi yek di van radeyan re derbas dibin. û ew jî wekî nîfşên mirov û heyberên din cur bi cur in. Qet jî naşbine hev û din. Hin ji wan mohra xwe li dem û domanên borî didin; nav û deng vedidin. Hin ji wan wekî teniya bi don in; li eniya çarenûsa mirovahiyê dikevin. Hin ji wan navê xwe bi tîpên zêrîn li newqa rûpelên dîrokê dinivîsin; nemir dibin û hin ji wan jî bêdeng ji qada jiyane vedikişin û diçin; ne navê wan dimîne û ne jî bêhn û beyta wan.

Wekî encam, zayîn, û mirin, rastîniyêke xwezayî ne. Hin tişt hene bi zayîne re dimirin. û hin tişt jî hene di mirinê de dijîn. Bi awayekî din, hin heyîn mirî dizên an bi zayîne re dimirin. û hin heyîn jî di mirinê de dizên û bi mirinê re dijîn. Mirov ne dikare her car zayîne wekî destpêka jiyane bibîne û ne jî mirinê wekî bidawîbûna jiyane. Ango ne zayîn hertim nîşana hebûnê ye û ne jî mirin nîşana tunebûnê. Wekî hemû dijber û nakokiyên xwezayî, car caran ling dibin serî û û car caran jî serî dibin ling.

Zayîn û mirin jî wisa ne. Gelek caran cih diguherin. Geh zayîn dibe mirineke guherbar, kurt û demdemî. Geh jî mirin dibe zayîneke dûdirêj, mayînde û bêdawî.

Wekî ku Everett Diksen "Jiyane ne tiştêkî westar e. Belê yê ku nikarin hişmendiya xwe biguherînin, jiyane xwe ariwestînin."

Kaniya Helbestan

Ez Xortê Kurd im



Çeto Omerî

Xwedî text û birc im
Ez bi şapik û şalim
Xebatkarê welatin

ji dîrokê arim şewat im
Deşt û zozan, bax û çîmen, gul û sosin im
ji jiyane jîn û felatim
Dîcle û Ferat im.

Li sîpana xelat Mem im
Hasreta Zîn im
Ji keda dayîkan im
Hêviya welat im .

Di zîndana tarî Stêrk û Hevî me
Ez xortê kurd im ez xwedî war im
Şer naxwazim welatê xwe Dixwazim.

Aşiq perestê welat im, kelat im
Hêvî ya welat im, di himbêza dayîkan de
Zarokê bêşûç im, qêrîn û hawarê
Welat im Keferat im.

Xebatkarê Kurdistan im
Şêrê Amêd a şewat im, dengê Şêx Seîdê
kal im
Li Çarçira dengê Qazî yê kal im
Hawara dayîkan û Xebatkarê Barzanî yê
kalim

Li Dêrsîmê rastiya Kurdistan im
Tirsa dijminan û hawara Munzur im
Gola xwîna Şehîdan im

Li Agirî arim şewatim, dûmana
Kurdistan im

Hawara dayîkan û qêrîna zarokan im
Ez tirs dijminan im
Ez Xortê Kurdistan û dilsozê Şehîdan im

Jiruhar Amed
Jêder: amidakurd

Navê Min Kurd e...



Paşa Amedî

Ez ji Hz. Adem û tufana Hz. Nûh vir de milletekî mezin im. Wek netewe pir kevn im. Salê min bipirsî nayê bîra min. Ji tufana Hz. Nûh ve vir de ez li ser pême. Ez tim û tim pêşda çûm e, bûme xwedî şaristaniyet, axa min ji gelek medeniyatan re bawtî kiriye. Kî hatiye mêvantiya min, min xweş hewandiye û jêre îkramî kiriye, dijmin jî hatiye cem min, min dilê wan neşkandiye, kî ji min tiştê xwestiye min bêkêmasî dayê û timahî nekiriye.

Gellek millet li min zulm û zorî kirine, nanê min ji destê min digirtin, şîlpax li min xistine, serê min şikandine, nigê min birîn kirîne û ez topal kirime, pir caran jî milê min şikandine û di çîh de tevizandine. Li ber zulma wan de tim bi qehr û bi xişim bûm, car jî min sebr dikir û min digot ku ev gel birayên min in, ji nezaniyê li min zulm dikin, tev ji min re bira ne ez ji birayên xwe naqetim, lewra ew birayên min in.

Carna jî ji birçîna, bi zulmê û bi berketinê ve nexweş ketime û di pir bêhaliyê de kesek nehat hewara min, ne pirs kirin ka tu di çi rewşê de yî, derî li min venekirin.

Di jiyana xwe de min gotiye bila zikê min têr be bes e, min nanê kesî jî negirtiye û niheqî jî li kesî nekiriye, min ax û mala kesekî ji dest wan negirtiye ku ez bibim xwedî mal, hîna jî di bîr û heşê min de tune...
Carna jî hevalên min ên ku ez bi wan bawer bûm, min bi wan re biratî dikir, car jî serê min dişkandin. Ne qayîl bûn ku ez rabim ser xwe û ser pê. Ji alîkî de dijmin, alîkî de jî hevalên min li min dixistin û ez diqewirandin.

Ev birana ji min re digotin "Tu bêeslî yan jî zuryeta me yî yan tu ne milletî..." ez milet ne dihesibandim û li min zorî dikirin. Li ber min xweş dikirin, li pişt jî li lingê min dixistin, min digot yaw ka ez birayê we bûm? Em bira bûn? Bi min re şer û, pevçûn çêdikirin di nav gelê min de kî bi a wan dikir û bêdil bûn wan dikirin axa û beg, kî ji wan re hez nedikir û li dijî wan bûn, ew dikirin xulam, gelê min tim bi paşda xistin, cahîl û nezan xistin ku li mîrata min xwedî derkevin û ew jî axa min bikin xaka xwe.

Ez li ser axa xwe, di welatê xwe de bê welat bûm. Di welatê xwe de stûyê min tim xwar û mîna sêwiya bûm.

Hezar û pênsed sal e ku ez di xew de bûm, bi saya mamostayê xwe yê Seîdê Kurdî ez li xewe hay bûm û ji

min re bû sibe, roj ji min re derket...

Êdî rabûme ser xwe. Neyara fehm kiriye ku ez şiyar bûme, dîsa ji min re dibêjin "Tu birayê me yî, em bira ne, em misliman in..."

Rast e em birayên hev in, em bira bûn, ma qey biratî heqê min xwarin e? biratî min ne naskirine? bi min re pevçûn e, ...? Ma di biratiyê de zilm heye...? Hûn li min zilm dikin û navê wê datînin biratî û mislimantî, ma êdî ji zilma we re ne besn e...?

Birano! Di dîroka berê bigre heta niha min ji we re çî kiriye, nanê kê xwariye, min ax û welatê kê ji dest girtiye, bipirsîn, vekolin, bikin û bibêjin? Ka ji min re bibêjin? Min li we çikiriye?

Ku biratî be ez biratiya mislimantiyê dixwazim, kî bi min re biratiya heqqiyê bike, bila werin. Ez gel im, netew im, navê min milletê Kurd e, paşnavê min jî Kurd e, kî min Kurd qebûl dike yan jî qebûl bike, min nas bike bila werin.

Ez ji bira re bira, neyara re neyar im û ji dijmina re dijmin im. Hûn êdî min nikarin bixapînin, xapandin û dekenê we bes e, ez cardin jî bang dikim û bizanibin ku navê min Kurd e, paşnavê min jî Kurdistan e.

'Heger 20 milyon kurd ne bextewar bin, em jî ne bextewar in'

Komeke rewşenbîr û nivîskarên tirk û nûnerên sendîka û rêxistinên sivîl, ji bo piştgirîdayîna BDP'ê, avahiya BDP'ê ya Stembolê ziyaret kirin. Ku ji aliyê Hasîp Kaplan, Akın Birdal û Serokê BDP'ê yê Stembolê Hüseyin Barış ve hatin pêşwazîkirin.

Hasîp Kaplan da zanîn ku heger li Tirkîyeyê hêzên demokratîk, rewşenbîr, elewî û kesên tehde dibînin destê xwe bidin hev, dê derfet çêbibe ku bihêz bibin. Kaplan, li axaftina xwe weha berdewam kir: "Heger li kolanan û li meclîsê hizûr nema be, Makezagonek nû nehatibe sererastkirin, zagona partiyên siyasî nehatibe nûkirin, bendava %10 nehatibe guhertin û hemû Serokên Partiyên ji hev xeyidî bin, wê meclîs bikaribe çî safî bike? Kaplan, dûre ji bo şandeya mêvanan

ev fiqre bibîranî:"

"Baxçelî, Baykal û Erdoxan di Teyarê ne. Baxçelî, bi awayek dizî ji Baykal re dibêje: Heger ez 20 lîreyan ji Balafirê bavêjim erdê, dê 20 kes pê kêfxweş bibin'. Baykal jî dibêje `Ew jî tiştê e! Heger ez 50 lîreyan bavêjim, dê 50 kes pê şa bibin.' Dor hatiye Erdoxan û ew jî gotiye `Ez jî 100 lîreyan bavêjim jêr, dê 100 kes pê şa bibin.' Li ser van axaftinan, Pîlot aciz bûye û gotiye, li ber van siyasatên we yê xirab, heger ez we her sê kesan ji teyarê bavêjim, wê 70 milyon kes pê şa bibin." Nivîskar û rewşenbîr Vedat Türkalî jî li vê derê bi vê axaftinê piştgirî da BDP'ê û kurdan: "Heta ku 15-20 milyon kurd nebêjin em bextewar in, wê li vî welatî tu kes bextewar nebe. Ez êdî şerm dikim ku li ser vê meselê biaxifim. Pergal, di destê hêzên tarî de ye. Ji bo



Vedat Türkalî

proje yê Kurdistanê, 3 trilyon dolarî dikin bombe û davêjin çiya, kevir û însanan.

Divê hesabê vê yekê bê pirsîn. Em bi DTP'ê bextewar bûn û me êdî baweriya xwe pê dianî. Ew jî ji holê rakirin. Haya wan jê nîne ku, zerarê didin biratiya gelan."

Rizgarî Online

Şiroveya Gotinên Pêşyan

Beşa 8



Çiya Mazî

WERGER Û GOTINÊN PÊŞYAN:

Me got Gotinên pêşyan, netewî ne. Dema li gor çand û jiyana mirovan çêdibin taybetiyek wan jî çêdibe. Ji ber wê yekê jî dema mirov bixwaze wergerîne, mirov nikare raste rast bi peyvan an peyv bi peyv biguherîne. Divê dema mirov gotin wergerand kîjan zimanî, wateya wê gotinê çi be li gor wê yekê mirov bifikire û bikarbîne. Pêwîst be mirov wergerand kîjan zimanî, gotinekê jê bibîne û yan di nava kevanê yan jî di têtîniyê de bikar bîne. Lê heke baş bê fêmkirin ev şewaz ne hewce ye. Lewre peyvên di zimanekî de û di nava gelekî de bi taybet bin û tiştin hebin ku bi taybet bin, dibe ku li welatekî din qet taybetiya wan tune be. Wê demê jî nayên fêmkirin an pir şaş dê bêne fêmkirin. Mînakên gotinên îngilîzî ku di rûpelên pêş de hatine şirovekirin vê yekê baş derdixin holê. Dibe ku bêne fêmkirin ka çi gotine, lê dibe ku wan gotinan qet li Kurdî û rewşa civaka Kurdî neyên. Ji ber wê yekê jî bi heman wateyan, lê bi awayekî din, li himber wan gotin di Kurdî de hene.

Wekî biwêjan gotinên pêşyan jî bi piranî dema ku ji zimanekî din bêne wergerandin, divê mirov pir lê miqate be û peyvan li gor wê rewşê bikar bîne. Heke ne wiha be carinan mirov tiştêkî ji wergerê fêm nake. Biwêj ji xwe hema hema bi temamî wiha nin. Lê gotinên pêşyan carinan ne hewceyî ku mirov gotina himber wê bibîne, bi kîjan zimanî be tê fêmkirin. Ya rast ew e ku mirov dema wergera gotin û biwêjan ji zimanekî din kir, mirov ya di wateya wê de tê gotin, bibîne an herduyan jî binivîsîne. Mînakên li jêr (mînakên biwêjên Tirkî) jî vê yekê diyar dikin.

Di pirtûka Musatafa AYDOĞAN ya bi navê "Berê Gotin Hebû" de, bi gelemperî li ser wergerê hatiye sekinandin û mijara wergera gotin û biwêjan jî wiha hatiye ravekirin:

"Heçî peyvên pêşyan in, ji bo nîşandana hêjayî û pîvanên civakan, pir girîng in. taybetiyên çandên cûda, xwe di wan de didin der. Ew li ser bingeha zanebûn û tecrûbeyên civatan hatin

avakirin, şîretên rênîşandêr in û di jiyana civakî de rolên pir mezin dileyizin.

Peyvên pêşyan wek îdiyoman (biwêj), peyvên taybetî nin û nayên guhertin. Qalibên wan serrastkirî henin. Lê hinek ferq henin ku peyvên pêşyan ji îdyoman vediqetînin. Beriya hertîştî, piraniya peyvên pêşyan gelek caran ji îdiyoman dirêjtir in û hevokên temamkirînin. Navokên peyvên pêşyan ji yê îdyoman konkrettir in. Peyvên pêşyan, gelek caran encama serpêhatiyên in û ji ber vê yekê taybetiyekê wan jî ew e ku ew an rewşekê, an jî çîrokekê dinimîn. Mirov nikare ji peyvên îdiyoman tê derxîne, bê mahneya wan çi ye. Ew di vî warî de xwediyên sîrrên mezin in, lê peyvên pêşyan mahneyên xwe zêde venaşêrin. Heta ji bo ku mirov bi giştî bikaribin têtîgihêjin, alîkariya mirovan dikin. Yanî ew di vê mahneyê de, ji îdyoman bi rehmtir in. Qesda min ne ew e ku tu astengên wergera peyvên pêşyan tune ye û hema mirov çawa çav li wan bikeve, mirovê bikaribe pir bi hêsaniyê û bê problem wan wergerîne. Heçî peyvên pêşyan in, wergera wan bi qasî ya îdyom û peyvên argoyî ne dijwar be jî dîsa divê mirov li wergera wan pir miqate be. Lê berê jî hat gotin, mahneyên gotinan ên leksîkalî alîkariya mirovan dikin, da mirov bikaribe şiroveya mahneyên peyvên pêşyan bike".

Wergera Gotinên Pêşyan Yên Îngilîzî û Li Himber Wan Yên Kurdî.

Ji bo wergera gotin û biwêjan mirov dikare hinek mînakên ji zimanê Îngilîzî bide. Di vê derê de hê baş tê fêmkirin ku werger divê çawa be.

All that glitters is not gold. Werger: (her tiştê ku dibiriqîne, ne zêr e).

Kurdî: "Her tiştê ku zer dike ne zêr e".

Barking dogs seldom bite: werger: (kuçikê ku bireye pir kêm dev li mirov dike)

Kurdî: "kuçikê ku pir direye nayê mirov"

Clothes do not make the man: werger: (kinc mirov nake zilam)

Kurdî: "esil ne çav û kildan e esil duhêl û badan e".

Easy come easy go. Werger: (tiştê hêsan tê hêsan dihere)

Kurdî: "malê heramiyê di rêya heramiyê de dihere", "malê xesis diçe fetis"

One swallow does not make a summer. Werger: (hehecikek nake havîn):

Kurdî: "bi gulekê nabe bihar"

Strike while the iron is hot. werger: (lêxistin di dema hesin germ be dibe)

Kurdî: "dema hesin germ be lêbide". "Mêr ew e ku hesin sor be rahêjê"

Who loves the rose should put up with its thorns: werger(yê ji gulê hez bike divê tevî sitriyê wê bistîne).

Kurdî: "gul bê sitrî nabe", "mîrovê ket dawetê wê xwe kil bike"

Word cut more than swords: werger: (peyv ji şûr hê xweştir dibire)

Kurdî: "Xweş dibe şûna xenceran xweş nabe şûna xeberan". "peyva xweş mar ji kulê derdixe".

Wergera gotinekê Erebi:

"is'esebê ir'rebeh": Her sibehek xêrek wê heye.

Kurdî: "sibe tê xêr pêre tê"

MÎNAKINE GOTINÊN PÊŞYAN JI NETEWÊYÊN DIN:

Gotinekê Erebi:

Ku hûn çil roj û çil şevî bi gel re bijîn, an hûnê bibin wekî wan an wan terk bikin.

Gotinekê Rûsî:

Cihê ku pere lê dipeyve, rastî bêdeng dimîne.

Sê Gotinên çînî:

Ava li dûr, ji tîbûna bi lez re nabe çare.

Ku mirov li qoziyê asê bibe, kîvroşkek jî dikare mirov bidire.

Ku tu guliyekî zeytunê di dilê xwe de bihewînî, dê çivîkên bi şîreşîr werin.

Gotinekê Almanî

Herkes hesinkarê bextiyariya xwe ye.

Gotinekê Emerîkî:

Zêr bi êgir, jin bi zêr, mêr bi jinê tê ezmûnkirin.

Gotinekê Latînî

Baweriya xwe bi tiştêkî neyê, li hemberî her tiştî bi tevdir be.

Gotinekê Alaskî:

Tu çiqasî hindik bilind bifirî, dema tu bikevî tuyê ewqas hindik biêşî.

Gotinekê Meksîkî:

Dema ku jin karibin bikenin meraq nekin wê bikenin, dema ku bixwazin, digirîn jî

Gotinekê Kongo:

Jin, wekî sî yê ye. Ji yê ku wê dişopîne direve, li pey yê pêşya xwe jî baz dide.

'Bila Sala 2010an Bibe Sala Zimanê Kurdî'

Serokê Enistîtoya kurd li Parîsê û Rêvebirê kanala Kurdî'ê, Dr. Kendal Nezan, di peyama pîrozbahiya xwe ya sersalê de, daxwaz kir ku, kurd li zimanê xwe xwedî derkevin û sala 2010'an bikin sala Zimanê



Kurdî. Dr. Kendal di axaftina xwe de bal kişand ser xwedîderketina li zimanê kurdî û ji hemû kurdan xwest ku hem bi malbatên xwe re û hem jî bi derûdorên xwe re bi kurdî bidin û bistînin. Herweha da zanîn ku, dema kurdên li ewrûpayê fêrî zimanên biyanî dibin û ji bo vê yekê jî gellek hewl didin, heger zimanê xwe nizanibin, dê ew yek kêmasî û şermek mezin be.

Dr. Kendal Nezan, di peyama xwe de bibîranî ku ferqa herî mezin ya kurdan bi Tirk, Erebi û Farisan, zimanê zikmakî ye û divê kurd girîngiya herî zêde bidin zimanê kurdî û bang li kurdan jî kir ku sala 2010an bikin Sala Zimanê Kurdî.

Rizgarî Online

Berê Partî û Siyaset, Niha Jî Xanî Ji Ehmed Turk Standin

Ehmet Turk heta niha li Enqerê li taxa Çukurambarê ya navdar dima. Cîranên wî piştî van bûyerên dawîn ji bo ku wî aciz û azar bidin, dest bi hildana alayên tirk li çarmedor, li balkon û




pencereyên xwe kirin. Lewre Ehmet Turk biryara barkirina ji wê derê da û li taxa Oranê di apartmaneka hemşeriyekî xwe yê Mêrdînî de xaniyek bi kirê girt. Paşan mala xwe bar kir û şande wir. Lê xwediyê xanî li ber derî ew girt, hêvî û tika jê kir ku ew kontrata xwe betal bike. Sebeb jî ew bû ku efserekî tirk ê bi pileya Albay di wî xaniyê de dima, bi zext û givaş gefan nehişt ku xanî bide Ehmet Turk. Lewre Ehmet Turk necar ma ku kontrate betalbike û esyayên xwe jî veqerand cihê berê. Niha gelo ê mala wî jî wek a Emîne Aynaya ku digot "Em ê biçin serê çiyê" bi rojan li ser tirombêla barhilgir bimîne. Qedera wî jî dê bibe wek ya Emîne Aynayê?

Ji Ahmet Turk re digotin siyasiyê kevok ê nermrew, ji Emîne Aynayê re jî digotin siyasiya req a bazî. Diyar e dawiya Ehmet Turk jî ê bibe wek ya Aynayê. Ew jî ê neçar bibe bêje" lazim e em berê xwe bidin çijan."

NETKURD

Dahênerê Alaya Kurdistanê Koça Dawiyê Kir

"Gotfirêd Cohanz Mulêr" nivîskarê Pirtûka xwe vedizîn ji kurdistagirtî (Einbuch ins verschlossene Kurdistan) û Efsere berê yê Almanayê, di salên 40î ên Sedsala 20'an de, tevî kurdekî Hewlêrî bi navê Remzî Nafi, Ala Kurdistanê çêkirin. Ew meha borî di temenê 95 saliyê de çû ser dilowaniya xwe û li ser wesiya xwe bi ala Kurdistanê li bajarê Birlînê hat veşartin. "Frank Haler" hevalê wî di vê



derheqê de dide zanîn ku di demên dawîn ên temenê xwe de, Gotfirêd ala Kurdistanê di dest xwe de girt û pir giriya. Dibêje ku ew yek ji wan kesan bû ku bo cara dawîn pêre axiviye û alayek Kurdistanê pêşkêşî wî kiriye. Herwiha dibêje dema ku Gotfirêd bi yekcarî çavên xwe li dunyayê girtin, ala Kurdistanê di dest wî de bû.

Rudaw .net

Sala 2010 Sala Ji Hevnêzîkbûna Kultoran

Kora Giştî a Netewên Yekbûyî, li ser pêşniyaza Serkomarê Qezaxistanê Nur Elsutan Nezebayav, sala 2010'an bi sala navnetewî a ji hevnêzîk buna kultoran destnîşan kir.

Kora Giştî a Netewên Yekbûyî bi navdêrkirina



sala 2010'ê weke sala ji hev nêzîkbûna kultoran, hêviya nemana regezperestî, şer û nedadperweriyê ji he cihanê re xwest.

Îran Parazîtan Dixe Ser Kanalên Opozîsyonê

Di çend salên borî de Komara Îslamî a Îranê tim parazît xistine ser kanalên kurdî û Farsî yê Opozîsyonê. Lê midehek e ku asta wan pêlên parazîtê bihêztir kiriye ku li hin cihan, xelk nikarin mifahê ji kanalên esmanî yê Opozîsyonê bistînin.

Hêjayî gotinê ye hikûmeta Îranê di vê dawiyê de ji bilî parazîtan, çendî malperên înternetî û Pirtûk û Kovar fîltêr û qedexa kirine.

